Hejmar: 14, îlon 2009 - **Mijar:** Rewşa nirxên dîrokî li Kurdistanê
Navnîşan: EHR - Box 50 47, 141 05 Kungens Kurva - Sweden

Dosya Taybetî:

Rewşa eserên dîrokî li Herêma Kurdistanê

Nirx, anku eserên dîrokî, mîna peyker, keleh, kanalên avê û cihên olî û hwd, şahidbûnê ji hebûna çandan re dikin. Her nirxek dîrokî, ji bo çanda xwe, delîlek zindî ye. Lewma parastina nirxên dîrokî, xwedî derketina li dîrok, çand, bawerî û hunera xwe ye.

Ev demek e ji Başûrê Kurdistanê li ser pirsê nûçeyên cewaz belav dibin. Li ser talankirina eserên dîrokî, bê xwedîbûna wan, nêzîkbûnên şaş li wan û carna jî têkbirina nirxan bi rêya dezgehên fermî, nas, hevalbendên rêvebirên siyasî û hwd. nûçeyên belav dibin, mirov şok dike û mat mayî dihêle.

Di vê dosya taybetî de, em dixwazin bala çandên li herêmê û cîhanê bikşînin ser rewşa nirxên dîrokî li Herêma Kurdistanê. Zaniyarî, ji kanalên taybetî, kesayetiyên kurd, dezgeh û medîa kurdî hatine girtin. Çavkanî parastî ne.

Em eşkere dikin ku, pirsa eserên dîrokî li cem hinek dezgehên têkildar yên navnetewî tê niqaş kirin û hinek biryarên giring jî ji aliyê wan ve hatine girtin.

Di vê dosyayê de, nameyek giring ji Unescoyê jî tê pêşkêşkirin.

Armanca me ji amadekirina vê dosya taybetî ew e ku, şaşîtiyên têne kirin nîşan bidin. Çend nimuneyên hatine têk birin, pêşkêşî raya giştî bikin.

Bê guman e ku, deverên hatine xirab / talan kirin zêdetir in. Hayê me jê heye ku li Silêmaniyê xirab kirina çend deverên din dest pê kiriye.

Nirxên kevnare, dîroka me ye, malê me û yê tevahê mirovantiyê ye. Divê em li wan xwedî derkevin.

Wezîfeya Hikumeta Herêmê-KRG ew e ku xwedî li nirxên herêmê yên dîrokî derkeve. Rê li ber têkbirin û talanê bigire. Hêviya me ew e ku, şaşîtiyên hatine kirin bêne serastkirin û tevayên nirxan bêne parastin.

Daxwaziya me ji tevayê dezgehên herêmê û navnetewî, yên fermî û serbixwe ew e ku, li hemberî talan û têkbirina nirxên dîrokî li Herêma Kurdistanê, ku di wan de şopa gelê kurd, ermenî, asûrî ûhwd. hene, dengên xwe bilind bikin û mudaxeleya pêwîst bikin. Îlon 2009

Kadir Nadir, rêvebirê "Kampanya li dijî talankirina nirxên dîrokî li Kurdistanê"
Alî Mahmûd, endamê "Kardocide Watch – CHAK", Hollanda
Gabar Çiyan, rêvebirê "EuroKurd Human Rights- EHR", Stockholm
Jan Beth-Sawoce, rêvebirê "Mesopotamiska Institutet" ya Asuriyan li Swêdê

1- Bizmara Kanala Senharib

Kanal avê, di dema Senharibê Asurî de hatiye avakirin. Bi rêya kanalê, av ji bajarê Bestura ku 5-6 km ji Hewlêrê dûr e diherikî hetanî Hewlêrê. Dîroka çêkirina kanalê dirêjî berî ji dayikbûna Mesîh bi sedan salan dibe. Bi teknîkek bê qisûr hatiye ava kirin û kanal di bin erdê re, bi şêweyek sernixûmandî xwe gihandiye roja me. Li nik kanala avê, lewheyek ji kevirên taybetî (kevirên şahîk) hatibû bi cî kirin. Li ser lewheyê nivîsek dîrokî hebû û qala dîroka avakirina kanalê dihatê kirin…

Berî 5 salan çekdarên kurd ku ji aliyê rêvebirên Herêmê ve dihatin kontrol kirin, li ber çavên xelkê ew lewheya dîrokî ji cî rakirin û bi xwe re birin. Heta nuha çi berpirsiyar qala lewheyê nake. Cihê wê eşkere nake û li cihê we bi cî nake.

2- Şikefta Bastûna

Li aliyê Soran e. Nêzî bajarên Çoman û Rewandûz ê ye. 10 km ji şikefta ”Şaneder ”ê dûr e. Pir kevn e, emrê wê zêdeyî 2 milyon salan e. Zêdeyî 100 hezar salan, malîtî ji mirovan re kiriye. Zêdeyî 100 metreyan dirêjbûna wê heye. Kevir û alavên tê de ji aliyê gelek nesilan ve hatine bikaranîn û bi tevayî, şop û dîroka rûniştvanên herêmê hemêz dikin. Arkeologên rûsî di 2007 an de li wir kolandin pêkanîbûn. Hevpeyvîna bi wan re di Key TV de, serê salê hatibû weşandin. Li gorî wan, şikefta Bastûna malê mirovahiyê ye, haletên tê de pir giranbuha ne û pêwîste bêne parastin.

Li gorî zaniyariyên ketine destê me, 2 sal berê, Karwan Barzanî, bi zanatî anjî nezanî, beşek mezin ji alavên di şikeftê de derxistine derve û beşek ji wan avêtine zibilxanê û beşê din wunda ne…

3- Keleha Rewandûzê

Keleha Rewandûzê di dema Kor Mihemed Paşa de hatiye avakirin.

Hikumeta Herêmê, di 2007 an de projeyek anîna avê daye şîrketekî Turkiyê. Şîrketê, xeta kişandina avê di ber kelehê re derbas kiriye û beşek mezin ji kelehê xirab kiriye.

4- Mizgefta Kifrî

Mizgefta li bajarê Kifrî, ya bi navê "Xaneqal Şêx Mihemed Diyara" berî bi 75-80 salan hatibû avakirin. Li herêma Germiyan e.

Di avahiyê de hunera desta ya avakirina kurda piralî xuyanî dikir.

Mizgeft hate xirab kirin û di şûna de amadekarî têne kirin ku dikan (bazarek) bê avakirin.

5- Keleha Avdal

Keleh li Gundê Başkaliya Dinarta ye. Têra xwe kevnare ye.

Li gorî zaniyariyên gihiştine destê me, di 2007 an de derûdora Hoşyar Zebarî beşek mezin ji kelehê têk dane ku di şûna wê de jê re koşkekê ava bikin.

6- Têk birina Taxa Tacîl li Hewlêrê

Taxa Tacîl bajarê kevnare ye, anku weke Hewlêra kevnare jî dikare bê binavkirin. Bi qasî 100 metreyan dûrî keleha Hewlêrê ye. Xaniyên wê bi kevirên taybetî û nekişkirî hatine avakirin. Di wan de huner û hostebûna destan ya avakirina xaniyan xuyanî dike.

Tax, kevnare ye. Unesco û hejmarek mezin ji akademisyenan eşkere anine zimên ku divê ev dever bê parastin, û cî weke nirxek dîrokî û dewlemendiya netewî bê dîtin.

Lê berî nuha bi demek e kin, parêzgerên Hewlêrê li ber çavê niwênerên Unesco û zêdeyî 200 akademisyenan, bi dozeran 35 xaniyên dîrokî yên taxê xirab kirin.

Protesto mezin dibin

Li ser vê kirina neyênî ya parêzgerên Hewlerê, li welat û derveyî welêt protestoyên piralî dest pê kir. Hejmarek ji ronakbîrên kurdan komîteyek ava kirin û pirs anîne rojeva dezgehên têkildar yên navnetewî.
Li ser Kampanya li dijî talankirina nirxên dîrokî, nameya ji bo dezgehên navnetewî hatibû amadekirin bi ingilîzî bû û di meha sibatê de hatibû şandin. Em nameyê werdigerînin kurdî:

"Têkbirina nirxên çanda kevnare rawestînin

Hewlêr (Erbîl) bajarek li başûrê Kurdistanê (Iraq) ye û yek ji kevîntirîn bajar e li cîhanê ku mirovan jiyana xwe li wir domandine. Lewheyen ku nivîsên dîrokî hemêz dikin (ji kolanên arkeolojîk hatine bidest xistin) ji dema Sumeran mane û pişta xwe didin berî nuha bi 6000 salan. Navenda bajêr ku bi navê "Urbillum" tê nasîn bi sûrekê hatiye parastin û ji gelek binahiyên kevnare pêk tê.

Hikumeta Herêma Kurdistanê-KRG li vê devera pir hesas programek avakirinê pêk tîne. Bêyî ku nirxên dîrokî û çandî, bidestxistinên ji kolanên arkeolojîk li ber çavan bigire, xirab kirinek piralî pêk dihêne. Bi rêya mekîne û dozeran, bazara wê, goristana wê, gelek nirxên dîrokî û bidestxistinê arkeolojîk ji holê rakirine.

Ev destpêk e. Hewildanên hene tirsek mezin peyde dike ku heman helwestê bi taybetî li Silêmanî û deverên din jî bikar bihênin.

Nuha, nirxên dîrokî û çandî li Kurdistanê bêxwedî ne û pêwîstiya wan bi parastinê hene. Ev hilweşandin û têkbirin destpêka talankirinê ye ku dikare fêdê bigêjîne hinek deveran. Bi vê rêyê gelek nirx dê têk biçin û wunda bibin.

Ji dezgeh û raya giştî ya navnetewî daxwaziya me ew e ku rê li ber van metodên barbarî bigirin û ji bo parastina nirxên dîrokî û çandî, zextên xwe yên li ser Hikumeta Herêma Kurdistanê-KRG ê zêdetir bikin. Pêwîst e talan û hilweşandina li dijî nirxên dîrokî, çandî û arkeolojîk pêk tê raweste."

Hewlêr dikeve bin parastina Unescoyê

Di 13 îlona 2009 de Unescoyê bi nameyek fermî dîtina xwe li ser pirsê eşkere kir. Nameya Unescoyê ji aliyê Teneishvili Tamara ve hatiye îmzekirin. Em nameyê werdigerînin kurdî:

"… Li ser pirsa pêşketinên li Kurdistanê ku li dijî nirxên çandî pêk tên û mirovan xemgîn dikin, ji aliyê Unescoyê li Iraqê hinek biryar li ser çalakiyan hate dayîn. Em dixwazin we, li ser wan biryarên xwe ronî bikin.

Unescoya li Iraqê, di destpêka sala 2009 an de li ser pirsa "çalakiyên li dijî nirxên dîrokî li Kurdistanê", navenda Unescoyê agahdar kir. Paşê hevdîtin bi wezîrê berpirsiyar ji Hikumeta Herêma Kurdistanê ku ji xebatên turîzmê mesûl e, pêk anî. Wezîrê Turîzmê bi giştî berspirsiyar e ku nirxên çandî yên kevnare biparêze. Me li ser pirsê xemgîniyên xwe û nerazîbûna xelkê anî zimên. Me xwest ku li gorî qanûna Iraqê ya 9 an benda 15 an nirxên dîrokî biparêze.

Weke hûn jî zanin, ji bo taxa Hewlêrê bikeve nav bajarên kevnare yên cîhanê, û her wisa di lîsteya Unescoyê cî bigire, xebatên me didomin. Berendametiya Hewlêrê bi dilê Hikumeta Herêmê ye. Lê qonaxa pejirandina Hewlêrê weke nirxên mirovahî yên cîhanê wextek dirêj digire, divê mirov vê yekê zanîbe. Ji bo berendametiyê jî divê zaniyariyên taybetî li gel serîlêdanê bê pêşkêşkirin û biryarek wisa ji navenda Unescoyê tê dayîn.

Em li Kurdistanê ji bo parastina nirxên kevnare xebatek piralî dikin. Hikumeta Herêmê ji bo ku nirxên çandî biparêze, roj bi roj pêş dikeve û bihêztir dibe. Lê dîsa jî divê bê zanîn ku Unesco nikare tevayên nirxên dîrokî li Kurdistanê biparêze. Hevkariya me bi gelek kesên pirspor li Kurdistanê didome û em giraniyê didin perwerdeyê ji bo ku bighêjin armancên xwe. Li muzexaneyên Kurdistanê serdanên me pêk hatin û em li ser planek netewî dixebitin ku pirs bê çareserkirin. Em dihênin zimên ku, divê Hikumeta Herêmê parastina nirxên dîrokî cidî bigire û xwedî li wan derkeve. Em li ser dixebitin ku 10 xaniyên li Hewlêrê ji nû ve di cihê wan yên kevnare de ava bikin…

Li ser pirsê xebatên me didomin û hûn dikarin zaniyarên firehtir ji me bigirin.
Bi silavên dostanî… "

EuroKurd News – eurokurd.net